Ji Penûsê Jinê Rastiya Jiyanê

RAPERÎN

Dîrok: Gulan 2023 Hejmar: 08

Keda Jinê Ya Hundirê Malê Keda Civakî Ye

JINA CIWAN
6
Em Li Dijî Feraseta Zilamperestiyê Tekoşîna Xwe Mezin Bikin

DÎROK
4
Beşek Ji Dîroka Têkoşîna Jinên Sosyalîst

NÊRÎN
2
Keda Me Bedena Me Nasnameya Me Ya Me Ye!

Keda Me Bedena Me Nasnameya Me Ya Me Ye!

Dîroka pergala baviksalar, bi hilweşîna hiqûqa dayiktî û bi zayîna milkê xas dest pê dike. Jin dibe milkê mêr. Ev şêweya milkê yekemîn ê dîrokê ye. Ev şêweya milk ji bav derbasî kur dibe. Mîrasê ku hatiye bi dest xistin jî di nav mêran de tê parvekirin. Bi vî awayî hiqûqa mîras derdikeve holê. Xisleta mêr a milk teşe digire. Tevahî rêveberî dikeve destê mêr. Bi şêweyeke ku spartiye zorê bendewariya jinê ya civakî û aborî dest pê dike.

Piştî ku bi rola zordestiyê bendewariya jinê ya civakî û aborî destpê dike bi rêya tundiyê ol, aded û teqelîd tê kirin mafeke pîroz. Bi vî awayî qelsî û paşve mayina jinê bi hezar salan e dibe nêrîneke cîhanî ya bingehîn. Û exlaq, fizyoloji, statistîk, dîrok, felsefe pevre dibe alavê xistina malan a jinê û dibe alavê mehkûmkirina koletiya malê ya jinê.

Têkîliya navbera jin û mêr êdî ji têkîliya navbera wekhevan derdikeve. Têkîliya jin û mêr sazûman dibe. Navê vê saziyê malbat e. Şêweyeke ku mêr jinê kontrol dike, civak jî jin û mêr kontrol dike pêş dikeve.

Ev şêweya milk, bi tevahî civakan ve û di dawiyê de bi kapîtalîzmê re dibe yek. Kapîtalîzm tevahî civakê dikişîne nav têkîliyên kapîtalîst. Jin û zarok weke hêza erzan a kar tevlî pêvajoya hilberanê dibin. Mêtîngeriya li ser ked û bedena jinê bi zêdebûn berdewam dike. Qadên mêtîngeriyê yên derve û hundirîn dibin yek. Weke bedemel di navbera karsaz, bav, bira, hevjîn û hwd. yê jinê de tifaqa mêtîngeriyê tê damezrandin.

Lê tiştekî din jî çêdibe, perdeya li ber çavê jinê vedibe: Ew jî bi mêr re heman karî dike. Lê dîsa jî ew ne wekhev in! Ew ne tenê ye, bi mîlyonan jin di vê rewşê de ne. Ji bo jinan heyameke têkoşînê ya nû destpê dike. Daxwaza "ji bo karê wekhev mûçeya wekhev" bilind dibe. Ev tenê ne weke daxwazeke aborî ye, di heman demê de weke daxwazeke polîtîk jî bilind dibe. Jin bi hêza xwe dihesin. Sedsala 20'emîn şahîdiya têkoşîna jinan a "ji bo karê wekhev mûçeya wekhev" dike. Destkeftinên pircure tên bi dest xistin.

Lê xeleka herî xeternak a têkoşîna wekhevî û azadiya jin têkoşîna jinan a li dijî koletiya malê ya jinê pêk tîne. Ji ber ku; heta ku rewşa jinên ku di malê de ya ku cihê yekemîn ê ku jin tê de hatiye kolekirin neguhere pergala koletiyê wê her tim xwe ji nû ve biafirîne. Li dijî ev pergala koletiyê yekemîn projeya berfireh a çaresariyê dikeve rojeva Şoreşa Cotmehê.

Di Helezoniya Cîhanên Ketûber de Afirandina Jina Nû!

Firaxên ku nehatine şuştin, zebaleya ku nehatiye avêtin, xwarina ku nehatiye çêkirin, cilên ku nehatine şuştin û nehatine aliqandin û hîna bi dehan tefsîlatên ku niha nayên bîra me... Em bifikirin ku jinê tenê rojekê di mal de kar nekiriye. Encamên vê çi dibin? Baş e lê bi rastî nirxa keda jinê tê dîtin? Çima dema ku ji bo pêwîstiyekê pere lazim dibe mêr pozê xwe ba dide û bi ser de deh gotinan dibêje. Ji ber li gorî fikra wî mêr bixwe li derve hemû roj xebitiye û jina kedkara malê tevahî roj li malê rûniştiye.

Çima mêr, wek hevjîn û bav ji heman erkên hundirê malê ne berpirsiyar e? Şuştina firaxan, paqijkirina malê, xwedîkirina zarok, çêkirina xwerin çima bibe qedera jinê? Çima jin her tim mecbûr e ku her tim izna mêr bixwaze?

Aksê vê em dikarin bêjin ku; weke hevjîn û dayik bicihanîna erkên me çima bibe koletî?

Em dikarin bêjin ku belkî di mêjiya hemû jinan de bi dehan pirsên bi vî rengî hebin. Li pişta van pirsan rastiya hezar salan a jinbûyîna ku hatiye fêrkirin heye. Pergala serdestiya mêr bi mêjî û hestên jinê lîstiye. Wê demê em vê pirsê jî bikin. Çima jin dema ku li derve jî dixebitin kar û barê malê, xwedîkirina zarokan dîsa li ser milê jinê ye? ji ber ku dîroka koletiya jinê xwe dispêre koletiya hundirê malê. Li dij derketina mêr, lêpirsînkirina kevneşopiyan weke cureyeke bêexlaqiyê tê mohrkirin. Tê wateya heramoyîbûna ji civakê. Yek bi yek li dijî vê ferasetê derketina jinan gelekî zehmet e. Lê mêjiya kolektîf (hevbeş) a jinan, rêxistin û zanebûna jinan xwedî hêza hilweşandina ev pergala riziyayî ye. Şoreşa jin ji berbangê ve xuya kiriye.

Di Şer û Jiyanê de Jina Azad

Wa di vê xalê de, şoreşa jin a sedsala 21'emîn de şoreşa jin deriyê azadiyê vedike. Şoreşa jin li dijî ev serdema tarî û pergala baviksalar serî hil dide. Li dijî ev pergala riziyayî dibe meşaleyeke ronahiyê.

Dewsa jinên ku bi sedsalan tune tên hesibandin, tên biçûkxistin û vederkirin jina ku hêza damezrêner a şoreşê ye distîne. Jin di tevahî qadên siyaset, şer û parastinê de cihê xwe digirin. Ji aliyê civakê ve rola ku jin li dijî dagirkerî û mêtîngeriyê dilîze tê ji bîrakirin. Di milê jinan de di şexsê dagirkerî, mêtîngerî û DAIŞ'ê de pergala serdestiya mêr hîna fehmbar bû. Lê di şênberiya bav, bira, mêrivên mêr de tehlîlkirina serdestiya mêr hîna sînordar e.

Di milê tehlîlkirina jina ku hepsî sêgoşeya malbat, zewac û zarokan hatiye kirin gelekî lawaz e. Hîna xeyalên jinên ciwan zewac û avakirina malbata xwe dixemilîne. Dikare jiyaneke ku di esîrîya eşqeke ku bi ezab ku ziviriyaye hezkirineke bengîtiyê hilbijêre.

Ev rastiya nakokiya jina ku li cepheyan li dijî serweriya mêr şer dike û şoreşa jinê diparêze ye. Di aliyekî de li dijî serdestiya mêr şer dike, lê di aliyê din de jî dixwaze li malê bibe koleyê mêr. Ji bo ku em karibin girêka vê nakokiyê çaresar bikin pêwîst e di milê têgîhiştina xwe ya eşqê de zanebûna xwe ya polîtîk, di milê têgîhiştina keda hundirê malê de zanebûna xwe ya polîtîk bilind bikin. Ji bo ku mêjiya jinê ya ku parçe bûye, dilê jinê yê ku pinciriye, jina ku di zexta malbat û eşîrê de asê bûye rizgariya xwe di zewacê de nebine em piştgiriya jinê bilind bikin. Em mafên xwe yên jin biparêzin û ji bo ku bi cî bên em têkoşîn bikin.

Berî çend salan komûnîstên şoreşger li vir hemleya "deriyê malên xwe ji şoreşê re vekin" dabûn destpêkirin. Di mişraqa vê hamleye de rêbaza wekheviya jin û mêr û azadiya jin disekiniya. Divê jin û mêr tenê ne li ber zagonên şoreşê, di heman demê de divê di tevahî qadên jiyanê û erkan de wekhev bibin. Divê ciyawaziyeke weke "karê jin û karê mêr" ji holê rabibe. Divê keda jinê ya hundirê malê bê dîtin. Armanca vê bangewaziyê weke duh îro jî ev e.

Rizgariya jinê ya ji koletiya malê elbet tenê bi pêşxistina zanebûnê ne sînordar e. Di heman demê de li hemberî jinan erka şoreşê ye jî. Hinek gavên ku jiyana jinan hîna hêsantir bike dikare ji îro de bê avêtin. Mînak rawdayên nû, ji bo xwendekaran saleyên mezin ên pêşxebatê, cilşoxaneyên hevbeş, qadên jiyana xetatên nû û hwd. dikarin bên vekirin. Li dijî feraseta kapîtalîst a serweriya mêr û mêtîngeriyê wê têkoşîna me ya azadiya jin bi ser bikeve.

Ji Komûnîstên Rojava Bangewaziya Tevlîbûna 1’ê Gulanê

Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) û Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ) berî 1’ê Gulanê xebatên xwe yên bangewaziya karker û kedkaran a tevlîbûna 1’ê Gulanê bi awayekî berfireh meşand.

Li Kobanê û Hesekê serlêdana febrîqe û karhehan hat kirin û li taxan serlêdanên malan hat kirin karker û kedkar ji bo tevlbûna çalakiya 1’ê Gulanê hatin vexwandin.

KOBANÊ

Li Kobanê endamên JKŞ serlêdana jinên karker a ên firnê kir, belavok belavokên JKŞ belavkirin û karker û kedkarên jin banga tevlîbûna çalakiya 1’ê Gulanê kirin. Endamên JKŞ di heman demê de serlêdana malan kir û ji bo tevlîbûna 1’ê Gulanê bangawaziya jinan kir.

HESEKÊ

Endamên JKŞ li Hesekê berî 1’ê Gulanê kar û xebatên berfireh meşandin. Endamên JKŞ di berfirehiya kar û xebata 1’ê Gulanê de serlêdana karkerên jin ên li kargehên dûrin, ta, û karkerên demsalî kir. Li van deran belavok hatin belavkirin û bangewaziya jinan hat kirin ku tevlî çalakiyên 1’ê Gulanê bibin. Ji pê ve ji aliyê endamên JKŞ’ ê ve di berfirehiya van xebatan de lafîte û afîşên 1’ê Gulanê hatin daliqandin.

Dîsa di berfirehiya van xebatan de serlêdana saziyên rêxistinên jin ên wekî Kongre Star, Meclîsa Jinên Sûrî û Partiya Guhertin hat kirin.

Cudayî van xebatan ji bo meclîsên JKŞ li ser dîroka 1’ê Gulanê perwerde hatin dayin. Di perwerdeyên ku ji aliyê nûnera JKŞ Fadya Sîdo ve hatiye dayin de li ser dîroka 1’ê Gulanê û rewşa jinên karker nîqaş hatin meşandin.

QAMIŞLO

Li Qamişlo endamên JKŞ û TKŞ li Qamişlo berî 1’ê Gulanê serlêdana karkerên jin kir û bangewaziya tevlîbûna 1’ê Gulanê kirin. Di serlêdanan de 1’ê Gulana karkerên jin hat pîrozkirin û li ser rewşa jinên karker û keda jinan a hundirê malê de nîqaş hatin meşandin.

Ji pê ve endamên JKŞ’ê li Kobanê, Hesekê, Dirbêsiyê û Hesekê bi awayekî girseyî û bi alên xwe tevlî çalakî û şahiyayên 1’ê Gulanê bûn.

DIRBÊSIYÊ

Li Dirbêsiyê endamên TKŞ û JKŞ ji bo bangawaziya 1’ê Gulanê lafîte û poster daliqandin. Li taxan û kolanan rojnameya Serkeftin belavkirin û bangewaziya gel a tevlîbûna 1’ê Gulanê kirin.

JKŞ êrîşa li Efrînê ya li ser zarok û dayika wê protesto kir

Endamên Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) li Hesekê bi daxuyanekê êrîşa tecawîzê ya li ser zaroka 10 salî û dayika wê protesto kir.

Li ser navê JKŞ emdama Meclîsa JKŞ Wîdad Mihemed daxuyanî xwend û di axaftina xwe de bal kişand ser sûcên dewleta Tirk û çeteyên wê yên wekî revandin, kuştin, tecawîz û hwd.

Wîdad Mihemed di axaftina xwe de da xuyakirin ku dewleta Tirk demografiya cihê ku dagir dike diguhere. Wîdad Mihemed axaftina xwe wiha berdewam kir “sûcên wekî revandin di saetên bi roj de di çavdêriya hêzên dagirker de pêk tên, heta îro aqûbeta bi sedan jinên ku di êrîşên dagirkeriyê de hatine dîl girtin hîna ne xuya ye. Teva dagirkeriya dewleta Tirk jinên Efrînî ku ji tevahî mafên xwe mehrûm hatine hiştin hîna bi şertên gelekî giran ve rû bi rû ne.”

Wîdad Mihemed di dawiya axaftinê de di bangewaziya xwe de got “Em bang dikin ki tevahî rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên jin li dijî sûcên wekî tacîz, tecawîz ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li dijî jinan pêk tîne di cih de dest bi têkoşînê bikin.”

Daxuyanî bi dirûşmeyên “Jin Jiyan Azadî” û “Bimre Dagirkerî” hat bi dawîkirin.

Komûnîstên Rojava Îsyan Tolhildana Pirsûsê Bi Bîr Anîn

JKŞ û TKŞ li Hesekê bi boneya 1’emîn salvegera şehadeta şervanê Rêxistina Jinên Komûnîst a MLKP Îsyan Tolhildana Pirsûsê bîranînek li dar xist.

Bîranîna ku li navenda TKŞ hatiye lidarxistin di şexsê şehîdan de bi deqekê rêzgirtin destpê kir. Piştî rêzgirtinê daxuyaniya Rêxistina Jinên Komûnîst a MLKP ku piştî şehadetê hatiye weşandin hat xwendin.

Di axaftina vekirinê de cihgirtina Îsyan Tolhildana Pirsûsê ya di parastina şoreşê de hat bi bîr xistin hat xuyakirin ku wê ji bo parastina şoreşê kedên mezin daye û hat gotin ku “Rêheval Îsyan malbat û jiyana xwe ya kevin li paş xwe hişt. Her tiştê xwe li paş xwe hişt û ji bo gel ji zilmê rizgar bike berê xwe da Rojava û ji bo vê gîhaşt asta şehadete.”

Komûnîstên Rojava dan xuyakirin ku wê têkoşîna şehîdan mezin bikin û heta dawî şoreşê biparêzin.

Di bîranînê de li ser navê Ciwanên Komûnîst Eylûl Baran axivî. Eylûl Baran di axaftina xwe de got “Rêheval Îsyan di nav refên ciwanan de tevlî refên têkoşînê bû. Rêheval Îsyan di heman demê de li dijî nexweşiya xwe jî têkoşîneke mezin da meşadin, li dijî nexweşiya xwe serî netewand, her tim bi ked moraleke mezin têkoşîna xwe meşand.”

Eylûl Baran di dawiya daxuyaniya xwe de bangewazî kir û got “tevlî nav refên partiyê bibin, azadî û têkoşîna xwe di nav refên partiyê de nas bikin, em li dijî faşîzm û mêtîngeriyê bi yek kulm, yek rih, yek beden têkoşîna xwe bidin meşandin.”

QAMIŞLO

Li Qamişlo bi boneya 1’emîn salvegera şervanê Rêxistina Jinên Komûnîst Îsyan Tolhildana Pirsusê li navenda TKŞ li ser LGBTÎ û nasnameyên bindest perwerdeyek hat li dar xistin. Di perwerdeya ku Endamên Meclîsa JKŞ tevlîbûn bi rêzgirtinê destpê kir. Piştî rêzgirtinê li ser LGBTÎ û jiyana Îsyan Tolhildana Pirsûsê perwerdeyê hat dayin. Di perwerdeyê de têgînên LGBTÎ (Lêzbiyan, Gay, Bîseksûal, Transeksûal û Înterseks) yek bi yek hatin şirivokirin. Piştî vê ji aliyê pergala kapîtalîst a serdestiya mêr ve şexsên LGBTÎ bi çi rengî tune tên hesibandin û rastî her cure tundiyê tên ew hat nîqaşkirin. Ji pê ve li ser jiyana Îsyan Tolhildana Pirsûsê hat nîqaşkirin. Hemû beşdar bi awayekî gelekî zindî tevlî nîqaşan bûn.

Beşek Ji Dîroka Têkoşîna Jinên Sosyalîst

Di destpêka dîroka mirovahiyê de Jin parêzvanên civaka komûnal, azadîxwaziya jin, wekhevîxwaz ku spartiya milkê civakî bûn. Piştre bi kombûna milk di destê mêran jin ji hat kirin milkê mêran. Li vir çînîbûna yekem derket holê. Mêran çîna serdestan, jinan çîna bindestan pêk dianî. Jinan ev yek bi hêsanî qebûl nekirin, bi salan têkoşiyan lê têkçûn. Di pergalên koledar û feodalî yên piştî wê de serdestiya mêr bi awayekî xurt berdewam kir.

Di sedsala 16'emîn de li Ewropayê pergala kapîtalîst di hemêza pergala feodalî de hêdî hêdî pêş ket û di niviya sedsala 19'emîn de bi sazî bû û teva vê çînîbûneke nû derket holê; Burjuvazî û karker. Lê bindestiya jinên ji her du çînan jî di nav pergala kapîtalîst a serweriya mêr de weke çîneke civakî berdewam kir.

Salên 1500 û 1600 ji bo karkeran heyameke ku birçitî, xizantî, bêmalî û bêkarî wekî herez mezin bûbû. Gelek kolanên bajarên Ewropayê bi jinên bêkar, parsek û jinên ku bedena xwe difirotin tije bû.

Di salên 1800'an de bi çêkirina makîneyên bidûkel û îcatkirina kehrebe pêvajoya ku weke şoreşa pîşesaziyê tê binavkirin destpê kir. Febrîqeyên mezin hatin vekirin, derbasî hilberana tomerî û lez hat bûyîn. Di vê heyamê de teva mêran jinan jî bi awayekî girseyî di febrîqeyan de dest bi xebitînê kirin û tevlî hilberanê bûn.

Bi derketina jinan a derve, dest bi xebitînê kirin di aliyekî de asoyên nû ji wê re vekir lê di aliyê din de barê wê hîna girantir kir. Teva bûyîna hêza erzan a kar bûyîna xizmetkarê mêr û nihêrvaniya malbatê ya jinê berdewam dikir. Jin hem li kargehan bi mêtîngeriyeke kedê ya hov û xedar ve rû bi rû dima, hem jî mecbûr dima ku li malê bê bêgerew bixebite.

Ligel jinên kedkar jinên burjuva jî bi encamên ku şêweya kapîtalîst a serdestiya mêr afirandiye ve rû bi rû bû. Wan jî êşa di rehenda rêza duyem de bûna jinê dikişand. Ji mafên milk, bidestxistina pîşe, hilbijartin û hatin hilbijartin û perwerde mehrûm bûn. Heman mehrûmiyet ji bo jinên karker û kedkar jî mijara gotinê bû. Lê ji bo jinên karker berdewamkirina jiyana rojaneyî, kar û nan, zêdebûna saetên xebatê pirsgêrêkên sereke bûn.

Ji ber vê yekê têkoşîna azadiya jinan hîna di destpêkê de weke tevgera jinên burjuva û tevgera jinên karker û kedkar li ser du esasên cuda dest bi pêketinê kiribû.

Di vê pêvajoyê de rêberên sosyalîst ên weke Clara Zetkin (Kilara Zetkîn), Engels (Encilos), Bebel ji bo azadiya jin angaşta yekkirina têkoşînê ya bi têkoşîna sosyalîst ve xistin holê.

Li Îngîlîstanê Yekîtiya Karkerên Jin a Neteweyî, Li Elmanyayê Yekîtiya Sendîkal a Navneteweyî ya Karkeran, li Emerîkayê Yekîtiya Sendîkayên Jin rêxistinên sereke yên ku jin tê de bi rêxistin dibûn bûn. Bi rêya van rêxistinan gelek girêv û çalakiyên girîng hatin lidarxistin. Jinan di oxira kar, nan, azadî, ji bo karê wekhev mûçeya wekhev, ji bo tevahî jinan mafa dengdanê têkoşiyan û mafên girîng bi dest xistin.

Jinên kedkar di heyamên şoreşan de derketin pêş. Di pêvajoya şoreşên 1848'an de bi helwestên xwe yên di berxwedanên berbestan de bûn pêşeng. Di komîna Parîsê ya 1871'an de jin bi lêhengiyên xwe tên bi bîr xistin.

Di nav ev têkoşîna jinên karker û kedkar de ku pêş ket jinên sosyalîst xwe bi rêxistinkirin. Bi konferansa 1'emîn a jinên sosyalîst a navneteweyî ya ku di sala 1907'an de li Stuttgart (Şûtûtgard) hatiye lidarxistin yekîtiya rêxistinî û bîrdoziyî ya tevgera jinên sosyalîst hat dabînkirin. Konferansa 2'emîn a jinên sosyalîst a navneteweyî jî di sala 1910'an de hat lidarxistin. Di vê konferansê de li ser pêşniyara rêbera sosyalîst komûnîst Clara Zetkin (Kilara Zetkîn) 8'ê Adarê weke "Roja Cîhanî ya Jinên Kedkar" hat îlankirin û li ser vê esasê rastiya 8'ê Adarê xwe dispêre dîroka têkoşîna jinên sosyalîst.

Clara Zetkin a ku dibêje "Jinên ku niviyê asîmanê ne niviyê şer in jî" gotina "ez dixwazim li tevahî qadên jiyanê şer bikim" di jiyana xwe de pêk anî. Tevger û rêxistinbûna jinên sosyalîst bi ked û têkoşîna Clara Zetkîn teşe girt û li ser vê esasê bû rêberê nezerî, polîtîk û bîrdoziyî ya tevgera jinên sosyalîst. Qasî ku di rêxistinbûna xweser û taybet a têkoşîna azadiya jin de rol lîstiye di pêkanîna bingehên nezerî yên şoreşa civakî de jî roleke girîng lîst.

Di heman salan de li Rûsyaya Qeysertiyê bi mîlyonan karker û kedkar ji bo daxwazên xwe yên polîtîk û azadiyê rabûbûn ser piyan û ber bi şoreşê ve dimeşiyan. Elbet jinan jî di vê têkoşînê de cihê xwe girtibûn. Di rêbertiya jinên komûnîst ên wekî Krupskaya Kollontay (Kolontay) û Clara Zetkîn de ji sala 1905'an pê ve çalakî û mitîngên bê hejmar hatin lidarxistin. Karkerên jin di 8'ê Adara sala 1917'an de bi tevgera girevê ya ku di febrîqeyên St.Petersbûrgê de de dan destpêkirin pilteya Şoreşa Cotmehê pêxistin.

Di Şoreşa Cotmehê de ji roja yekemîn de heta salên piştre jinên karker û kedkar destkeftiyên mezin bi dest xistin. Hîna di rojên yekemîn ên şoreşê de di makeqanûna şoreşê de wekheviya jin û mêr hat îlankirin. Bi civakîkirina milkê xas ji bo dawî lê anîna koletiya jinan gavên gelekî pêşketî hatin avêtin. Di nav salan de gelek daxwazên jinan hatin pêkanîn. Rêbaza "ji bo karê wekhev mûçeya wekhev" hat pejirandin. Seferberiya xwendin û nivîsandinê hat destpêkirin. Karên malê û xwedîkirina zarokan hat civakîkirin; cilşoxane, xwaringehên hevbeş û li her derê rawda hatin vekirin. Mafa perwerdeya bêpere, mafa tendurîstî, izna bi destmiz a welidîn û mafa kurtajê hat pejirandin. Ev gîştî encamên têkoşîna tevgera jinên sosyalîst bû. Ji wan rojan heta îro têkoşîna jinên sosyalîst car caran bi têkçûn, car caran bi serkeftinan berdewam dike. Ev têkoşîn wê heta serkeftina komûnîzma ku pergaleke wekheviya zayendî ya civakî ye berdewam bike.

Dijminên Jinan li Efrînê Sûcên Xwe Didomînin

Di sala 2018 de bajarê Efrîn ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve rastî êrîşeke dagirkeriyê hat. Bi ew êrîşa ku li ser Efrînê de hat destpêkirin, destpêkê de jin hedef hat girtin. Çeteyên DAİŞ bi hevkariya dewleta Tirk êrîşa li ser gelê Efrînê berdewam dike. Bi sedan jinên Efrînê rastî tacîz, tecawîz, kuştin û revandinê hatin. Jinên Efrînê her tim bi tirs jiyan dikin. Li hemberî van êrîşan dewletên navnetewî bêdeng dimînin. Êdî zarokên 10 salî rastî tecawizê tên û piştre tên kuştin. Ev tê wateya ku her kes şirîkên van sûçan in. Ev pênç sal in jinên Efrînê di bin van êrîşan de jiyan dikin. Di bin navê ol û îslamê de jinan dixin nav hîcabê. Li gorî xwe qanûnan li ser wan ditebiqînin. Yanê ji bo wan jin ne tu tişt tê ditin. Ev rêbaza çeteyên el Nûsra û dewletê Tirk êdî hatiye ezberkirin. Îro çeteyên el Nûsra, Sultan Mûrad û hwd. bi siyaseta faşîzma AKP'ê û MHP'ê tev digerin. AKP'e li ser navê îslamkeriya polîtîk bandora xwe û biryarên xwe dide qabûlkirin û siyasetê xwe dide meşandin .

Polîtîkaya AKP'ê ya li hemberî jinê û siyaseta çeteyan yek e. Sîstema baviksalarî berê desthiladariya xwe li ser jinê ava dike û piştre li ser tevahiya civakê serdest dibe. Ji bo vê jî hedefa yekemîn a pergala zilamperestiyê jin e. AKP nûnerê Îslama polîtîk e, dijminatiya wê ya li hemberî jinê li ser esasa Îslama polîtîk e. Lê ne tenê bi vê ne sînordar e, feraseta zilamperestiyê ji bo koletiy jinê her tiştî seferber dike û bi her kesî re tifaqan çêdike. Pergala baviksalarî ya kapîtalîst bi Îslama polîtîk, dewlet, malbat, ol, aborî û hwd. re hevalbendiyê dike. Bi tifaqa li dijî jinan tev digere. Lewma beri ku êrîşa axên me bikin û dagir bikin destpêkê de êrîşê jinan dikin. Em li Rojhilata Navîn de jiyan dikin. Û li Rojhilata Navîn di bin siya îslamê de jiyana xwe derbas dikin. Li vir jin weke namûs tên ditin. Li vir zext û êrîş li ser jinan pir in, li vir feraseta baviksalarî gelekî kûr e. Ji ber wê bi feraseta zilamperestiyê nêz dibin û li ser vê esasê êrîşên xwe didomînin û heya niha êrîş berdevam in.

Weke namûs dîtina jinê qelsiya herî mezin a civaka Rojhilata Navîn e. Bi her cûre êrîşên li ser jinan dixwazin jinan di malê de bigirin. pergala baviksalar a kapîtalîst li ser esasa dîlgirtina jinê hemû civakê dîl digire. Li Efrînê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê jinan dike hedef ku şêniyên Efrînê binpê bikin. Tirsa tacîz, tecawîz, revandin, zewaca bi zorê ji çekên dagirkeran bi bandortir e. Bi taybetî jinên ku berî dagirkeriyê di saziyên şoreşê de xebitîne tên hedef girtin. Yek ji armanca wê dixwazin ku bi van êrîşan mesajekê bidin tevahî jinan û vîna şoreşa jin bişkînin. Dewleta navneteweyî yên ku bi navê mafên mirovan diaxivin çavên xwe ji van êrîşan re digirin. Dewletên navneteweyî dema şaştiyên dewleta Tirk yên cuda dibînin li hember van şaştiyan disekine, lê dema mijar dibe jin û gelê Kurd her kes bêdeng dimîne. Ji ber ku dewleta Tirk û dewleta navnetewî ji têkoşîna jinan ditirsin. Yani dema jin serî li hemberî van êrîşan rakin, wê pergala wan a çetetî û dagirkeriyê xirab bibe.

Ji ber wê li Efrînê zêde êrîşên xwe li ser jinan dikin. Dema ku dibêjin ''dijminê dijminê min dostê min e'' ev gotin ji bo dewletên navneteweyî derbasdar e. Dema mesele dibe jin, her dewlet dibe yek. Ji ber ku li hemberî tecawîza zaroka 10 salê bêdeng man, piştî wê bi çar rojan disa zarokeke din a bi temenê 14 salî rastî tecawîz hat û piştre hat kuştin. Dîsa di vê demê de zarokek ji bo ku bi çeteyekî re bê zewicandin bi zorê hat revandin. Dema ku her kes bêdeng dimînin çeteyên dewleta Tirk her roj keç û jinên me direvînin, tecawîz dikin, qetil dikin. Li Efrînê tu rêgez, zagon û rêzik nîn e ku pêşî li êrîşên çeteyan ên li ser jin û zarokan bê girtin. Jiyana di bin dagirkeriyê de di serî de ewlehiya jiyanê ya jinan tine dike. Em dizanin ku dewleta Tirk a dagirker li pişt êrîşên çeteyan ên li dijî jinan e. Li hemberî ev siyaseta qirêj pêwîst e gelê Efrîn têkoşîn bike. Têkoşîna jinên Efrînê pêşengtiya gelê Efrînê ye. Ji bo wê naxwazin jin derkeve pêş û pêşengtiya gelê Efrînê bike. Ji ber ku dewletên kapîtalîst ên baviksalar dizanin ku, têkoşîna azadiya jinan li her derê dimeşe. Ji Rojava heta Rojhilat, ji Îranê heta Fransa, ji Efxanîstan heya Îngîlîstan, ji Efrîqayê heya Emerîkayê têkoşîna jinan herî pêş de ye.

Ji bo jinên Efrînê xweparastin pêwîst e. Pir sedemên ku jinên Efrînê li ber xwe bidin û xwe biparêzin hene. Wek jinên Hindistanê yên ku serî li hemberî zordestiyê netewand û koma jinên bi "fîstanê pembe" avakirin û xwe diparêzin. Wek jinên bi "darê sor" ên li Bakurê Kurdistanê xwe li hemberî tacîz û destdirêjiya zilam ava kir û xwe û her jinekê ku rastî destdirêjî dihat diparastin.

Ji bo jinên Efrînê berxwedan pêwîst e. Pêwîst e wekî jinên Îranê ku bi dirûşmeya "Jin Jiyan Azadî" derketin qadan û sîstema Melelî ya zilamperest ji tirsan lerizandin jinên Efrînê jî dakevin qadan û dawî li dagirkerî, tacîz, destdirêjî û qetlîamên jin û zarokan bînin.

Li gorî Erdogan û çeteyên wî, sûcên li dijî jinê weke meseleyeke malbatî ye, jin tê sûcdarkirin û tê veşartin. Em weke jin tu carî nikarin bibêjin tundî, tacîz, destavêtin, an kuştina jinê mijareke şexsî ye yan jî meseleyeke malbatî ye. Tundiya li ser jinê, çi li hundir û çi li derve, ne pirsgêrêkeke malbatî ye. Pirsgêrêkeke civakî û polîtîk e û me hemûyan eleqedar dike. Em bi têkoşîn û hevgirtina xwe dikarin li dijî van sûçan derkevin bi dawî bikin. Yekîtiya me hêza me ye. Hêza me pêşeroja me ye.

Ji bo jinên Efrînê têkoşîn û rêxistinbûneke xurt pêwîst e. Tiştekî ku em winda bikin tune, lê cîhaneke ku em bi dest bixin heye. Lewma ji bilî şer û berxwedanê tu çareya me nema ye. Ji ber vê yekê em nikarin bêjin ku ez westiyam, ez bêhal mam û hwd. Em her tim nikarin bibêjin bila jinên din bixebitin, bila ew ked bidin. Belê, dibe ku jinên din jî serî hildin, têbikoşin, çewisandinê qebûl nekin, lê divê em tevî hemû zehmetî û bedelên wan di rêya serkeftinê de têkoşîna xwe bidomînin.

DÎROKA TÊKOŞÎNA JINÊN ÎRANÊ

Jinên Îranî li dijî Şah têkoşîneke demdirêj û ser bilind meşandin. Di şoreşa 11'ê Sibata 1979'an de ji bo rûxandina rejîma Şah de roleke berfireh û diyar a têkoşîna jinan hebû. Di berdewamiya vê têkoşînê de guhertinên mezin hatin afirandin û ev ji bo têkoşîna jinên Îranê bû pêngaveke mezin û bingehîn. Li Îranê ji 150 salî ve heta îro rastiya siyasetê dîroka têkoşîna jinan her tim hat paşguhkirin. Lê têkoşîna jinan hişt ku ev mîras bigêhêje heta îro. Ev rola pêşeng û diyarker a jinê tevî zehmetî, sînordarkirin û astengiyan biryardariya jinan nîşan dide. Lê ya herî girîng li dijî hikûmetên orotîter li qada şer hebûna ev tevgera jinan nîşana pêşketina civakê ye. Û heta asta ku jin di têkoşîna azadiyê de roleke çalaktir bilîzin, wê heta asta ku tevkariyê li pêkanîna wekhevî û alîkariyên mezintir bikin. Ji aliyê din ve, bêyî wekheviyeke rast di navbera jin û mêr de, her pêşketineke di warên siyasî, aborî û civakî de ne bi bandor e. Di vî warî de serhildanên ku di sala 1979'an de bû sedema rûxandina dîkdatoriya Şah di dîroka têkoşîna gelên Îranê ya 100 sal berê de pêleke mezin nîşan da.

Du Jinên Pêşeng

Beriya her tiştî ev hebûna berfireh di bin bandora têkoşîna jinên pêşeng û fidayî yên li dijî mêtîngeriyê û di qonaxa pêş de jî çalakiya dayikên şehîdan û malbatên girtiyên siyasî bû. Di salên 1960 û 1970'an de tevlîbûna jinên şoreşger ên weke Fatîme Emînî di nava rêxistina veşartî ya Rêxistina Mucahidîn a Gel û rêxistinên din ên şerker de kêm bû. Ji ber vê yekê van jinan bandoreke kûr li ser jinên ciwan ên zanîngehê û rewşenbîran dikir. Bi kurtasî amajekirinek li ser destan û têkoşîna du jinên pêşeng ên yekemîn ên Fidayiyên ku ji bo azadiya gelê xwe canê xwe dan e. Rêheval Fatima bi avakirina komeleya jinên pêşverû dest bi xebatên xwe yên siyasî kir. Piştî ku xwendina xwe ya zanîngehê qedand, pîşeya mamostetiyê kir. Bi Rêxistina Mucahidînên Gelê Îranê re komeleya xwe ava kir. Piştî paşketina Îlona 1971ê û girtina %90 ji rêvebiriya rêxistinê û gelek kadro û endamên wê, Fatima gelek erk û Berpirsiyartiyên şoreşger girt ser milê xwe. Di vî warî de çalakiyên berfireh dest pê kirin. Di 7'ê Adara 1975'an de hat girtin û şkencekirin. Fatima 5 meh û nîv rastî şkenceyên herî xirab hat û di Tebaxa (Tebaxa) 1975'an de bi şkenceyê giran şehîd ket. Bi vî awayî Fatima di têkoşîna li dijî Şah de bû şehîda yekem a jin. Yek ji jinên têkoşer a li dijî rejîma faşîst Mehrnûş Îbrahîmî bû. Îbrahîmî di sala 1947'an li Babîlê ji dayik dibe. Di sala 1966'an de tevlî rêxistina fedayiyên Gel a Îranê dibe. Di 21'ê Îlona 1971'ê de rayedarên SAVAK'ê li Tehranê maleke ku Mêhrnûş Îbrahîmî û yek ji hevrêyên xwe yên jin ji Fedayiyên Gel tê de bûn dorpêç kirin û Mêhrnûş Îbrahîmî piştî şerekî leheng bi pêkhateyên SAVAKê re jiyana xwe ji dest da. Yekemîn gerîlaya jin bû ku di rêya rizgariyê de bi lehengî jiyana xwe ji dest da.

Têkoşînên Li Dijî Melelî

Di mehên beriya serkeftina serhildana dij-şoreşê ya 11'ê Sibata 1979'an de jin li bajarên Îranê li dijî dîktatoriyê beşdarî xwepêşandanên biçûk û mezin bûn. Beşdarbûna zêde ya jinên ciwan di xwenîşandanan de li kêleka mêran û amadebûna hêdî hêdî nifşê wan ê berê, ango dayikên wan, li cihê bûyerê, ji bo jinên Îranê pêngaveke dûr û direj bû. Jin daketin qadan û daxwazên xwe yên azadiyê qîriyan. Ji ber ku di dîroka Îranê de beşdariya jinan di vî aliyê xwenîşandanên siyasî de heta wê rojê bêmînak bû. Jin di sala 1979'an de weke hêzeke nû û pir xeternak derketin ser dikê û roleke girîng û çalak lîstin.

Lê piştî serketina şoreşê, nakokîyek pir tirsnak derket holê. Ji aliyekî ve gelên civaka Îranê û di nav de jinên Îranî zêdetir daxwaza azadî û demokrasiyê dikirin û amade bûn ku bi pêş ve biçin û ji aliyê din ve jî desthiladariya siyasî, ango Xumeynî û melayên pê re, bi lez û bez bi dest xistin. Ev desthiladariya ku bi piştgiriya jinan bi ser ket û gelek soz dan jinan dixwastin jinan dîsa vegerînin mal. Bi zagonên şerîetê hîcap kirin kiryareke bi zorê. Lê hêza jinan ku di dema şoreşa antî monarşîst de derketiye holê li dijî ew fikra paşverû li ber xwe da. Di vê demê de serdemeke nû ya têkoşîna jinên Îranê dest pê kir. Piştî du hefteyan ji şoreşa 1979'an, ofîsa Xumeynî di 26'ê Sibatê de nameyek belav kir. Di ev nameya ku ragihandin de dihat gotin ku "pêkanîna qanûna parastina malbatê li hemû dadgehan rawestiyaye. di 8'ê Adara 1979'an de ji aliyê kabîneya hikûmeta demkî ve qanûna rakirina ji holê ya xebitîna jinê hat derxistin û qebûlkirin. Di 7'ê Adara 1979'an de nûçeya kombûna bi hezaran jinan a li paytext Tehranê li avahiya dadgêhê ji 4 bo şermezarkirina çewisandina bi darê zorê hat ragihandin ku di civînê de jinan li dijî betalkirina Qanûna Parastina Malbatê nerazîbûn nîşan dan. Ev xwenîşandana aştiyane ji aliyê hêzên ku ji aliyê hikûmeta nû ve hatibûn teşwîqkirin bi awayekî hovane hat tepisandin. Rêxistina Mucahidînên Gel di 12'ê Adara 1979'an de tevî fermana Xumeynî ya li ser ferzkirina perdeya bi darê zorê daxuyaniyek da û li ser mijara perdeyê ragihand: Ev pêvajo ji bo jinên Îranê bû serdema têkoşîneke nû. Li dijî siyaseta dijminatiya rejîma faşîst Melelî têkoşîneke bêhempa meşandin û rastî zilm şkenceyên herî mezin hatin. Lê tu carî dev ji têkoşîna xwe bernadan. Di her serhildana gel a li dijî rejîma faşîst a Melelî jin bûn pêşeng.

Li Îranê Jin Her Tim Bûn Hedefa Rejîmên Îslamkeriya Polîtîk

Jinan bi têkoşîna xwe rûyê bajarên Îranê guherandin, gelek tabûyên kevneşopî şkandin û ji bo nifşên berê bûn îlham. Lê jin her carê bi rû bi rû bûna şkenceyê, tundiya rejîmên faşîst ên îslamkeriya polîtîk hatin. Li dijî Artêşa Rizgariya Netewî ya Îranê serhildanên sala 2009 – 2017 – 2019 û 2022'an ên bûyerên mamoste, hemşîre, karker û kesên ku mafên wan hatine talankirin û beşên din ên hemwelatiyan pêk hat. Rêzên yekem de û rêvebirina serhildanên vê dawiyê li Îranê û hîn jî ber bi pêş ve diçe ku di bin desthiladariya melayan de ye, îro di cîhanê de bi zext û zordariya xwe ya sîstematîk û berbelav a li dijî jinan tê naskirin, lê ji aliyê din ve, rûyê jinan di xwepêşandanên wêrek ên Îranê de li cîhanê bûye nîşana nasnameya Jinên Îranî . Ev ne îdia ye, belkî rastiyek e ku her roj di wêne û fîlmên serhildana Îranê de tê dubarekirin. Ev ne diyardeyek e ku ji saetê derketiye, belkî encama zêdetir ji 150 salan têkoşîna jinên Îranê ji bo azadî û wekheviyê ye, ku niha xwe eşkere kiriye. Bê şik jinên Îranî di rêya dirêj a vê berxwedan û têkoşîna berdewam de, dê rûpelek di dîrokê de bizivirin û dîktatoriya serdema navîn a serwer li Îranê hilweşînin.

Her çiqasî ku jinên Îranê di tevahî serhildanan de weke kirde di refên herî pêş de cih bigirin jî bi taybet niha bi saya serhildana Jîna Emînî ya ku bi dirûşmeya "Jin Jiyan Azadî" berdewam dike siyaseta faşîst a Melelî ya dijminatiya jinê careke din derket holê. Îro tevahî civak bi pêşengtiya jinan li dijî rejîma îslamkeriya polîtîk faşîst a Melelî li ber xwe dide.

EZ HEBÛM EZ Ê HEBIM EZ HE ME

Rosa Luxembûrg di sala 1871ê de li Polonyayê di malbateke Yahudî de hat dinyayê. Dema ku ew neh salî bû malbata wê koçî Varşovayê kir. Di sala 1887 de, Rosa li vî bajarî lîse (bekelorya) bi pileya yekem qedand. Rosa Luxemburg hîna di temenê xwe yê ciwan de têkoşîna sosyalîzmê nas kir. Di temenê xwe yê 18 salî de ji ber têkoşîna xwe mecbûr ma ku koçberî Swêsreyê bibe. Di sala 1899'an de li zanîngeha Zûrîhê bû şagirt. Li vir perwerdeya felsefe, dîrok, aborî û bîrkarî dît. Di heman demê de, wê bi şoreşgerên din ên Polonî yên li mişextiyê xebatên xwe yên rêxistinkirinê domand. Kovara ku bi qaçaxî derbasî Polonyayê kiribûn, derdixist. Ew xwendekareke jîr û xebatkar bû. Di nava şoreşgerên ku neçar man ji welatên cuda koçî vî welatî bibin, bi nêrîna xwe ya li ser pirsgêrêkên cîhanê, bi hêza xwe ya çaresariya pirsgêrêkan, bi bîr û hizra xwe ya birûmet û pêşbîniya xwe bal kişand. Şoreşgerê Polonî Leo Joges û Rosa ku di wê demê de li Zûrihê bi hev re têkoşîn dikirin, evîndar dibin û dizewicin. Ji ber têkoşîna xwe di demên cuda cuda de gelek salan di zindanê de dimîne lê tu carî dev ji têkoşîna xwe bernade.

Di sala 1898'an de diçe Elmanyayê. Di 1890'an de piştî zagona Bîsmark ku demokrasiya civakî qedexe dikir hat betalkirin ket parlementoya sosyalîst. Rosa di sala 1898'an de diçe Berlînê û beşdarî Partiya Sosyal Demokrat a Elmanyayê (SPD) dibe. Di sala 1990'an de raman û nivîsên Rosayê bandoreke mezin afirand. Di van salan de gelek caran ket zindanê. Astengiya lingê wê tu carî têkoşîna wê asteng nake. Rosa bi xwendin û nivîsandina xwe weke rêbereke jin a komûnîst her tim xwe pêş dixe. Piştî demeke gelekî kin di nav Partiya Komûnîst a Elmanyayê de cih digire û her tim li dijî xeta reformîst xeta şoreşgertiyê diparêze. Bi ketina Rosa ya nav partiyê re, agirbesta ku di navbera baskê reformxwaz û baskê şoreşger de, ku li dora ramanên Eduard Bernstein kom bûbûn, ku bi reforman rewşa çîna karkeran baştir dibe, hewcedarî bi şoreşê nîn e, bi dawî bû. Rosa pirtûka Bernstein ya bi navê "Şoreşa Civakî an Reform?" rexne kir û ew bi sextekariya Marksîzmê tawanbar kir.

Di sala 1899'an de wek edîtorê rojnameya Leipzig People ya Partiyê hat erkdarkirin. Di dema edîtoriya wê de, naveroka rojnameyan û her wiha awayê xîtabî xwendevanan

bi lez û bez guherî. Ew serpêhatiya xwe ya rojnamegeriyê wiha pênase dike: "Ez bi berdewamî ji xwe re girîngiya nivîsandina bi hezkirin, dilxwazî, ketina nav mijarê û nivîsandina bi hest dubare dikim." Bi rêbera komûnîst a jin Clara Zetkîn re hêvaltiya wê xurt bû. Di sala 1910'an de, di 2. Konferansa Navneteweyî ya Jinên Sosyalîst de, ji Partiya Sosyal Demokrat a Elman Clara Zetkin û Rosa Luxemburg pêşniyarek pêşkêş kirin. Di vê civînê de pêşniyara ji bo bîranîna jinên kedkar ên di komkujiya 1857'an a li Emerîkayê de jiyana xwe ji dest dane, 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê bê îlankirin, bi yekdengî hate qebûlkirin.

Di vê navberê de, li Rûsyayê, beriya şoreşa Sibatê ya 1905-1906, Rosa ji girtîgehê derketibû. Şoreşa Cotmehê bi coş û kelacaneke mezin pêşwazî dike. Rosa li ser nezerî, bîrdozî, rewşa karker û kedkaran dikeve nav fikrandineke kûr û ji bo vê xwedî afirineriyeke mezin e. Lenîn dem bi dem nêrînên Roza Luxsembûrg û Partiya Komûnîst a Elmanyayê rexne kiribû, Lê Lenîn ji bo Rosa bi gotina ew "hilo ye û wê weke hilo bimîne" teqdîr dikir.

Dema şerê yekem ê cîhanê Rosa û çend hevalên xwe li dijî helwesta piştgirî dayina burjuvaziya Elmanyayê ya şaş sekinîn. Rosa û hevalên xwe piştgirî dayina burjuvazi welatê xwe ya komûnîstan red kirin û ji bo hilweşandina kapîtalîzmê bang li karker û kedkarên Elmanyayê dikirin, di axaftina xwe ya sala 1914'an de ji ber ku bang li ciwanan kiribû ku neçin şerê emperyalî, hate girtin. Şoreşa Rûsyayê di payiza 1918'an de bandor li Elmanyayê jî kir. Çîna karkerên Elman li welatê xwe, mîna li Rûsyayê, ji bo damezrandina Sovyetê serî hilda. Rosa pêşengtî û rêbertiya vê pêvajoyê kir.

Dema ku Elmanya ji ber serhildanên 1918'an hejand, Rosa Luxemburg di zindanê de bû. Di bin bandora tevgerên ku rabûn de dewlet neçar ma ku wê berde. Li Berlînê dest bi edîtoriya rojnameya "Rote Fahne" kir. Ji ber polîtîkayên şer parçebûna di nava SDP'ê de zêde bû. Rosa ligel Liebknecht ji Partiyê derket û Yekîtiya Spartacus (Spartakûs) ava kir û di destpêka sala 1918/1919'an de Partiya Komunîst a Elman ava kir. Di dema destpêkirina serhildanên şoreşgerî de her çend hejmara wan hindik bû jî, lê ji bo rêbertiya vê tevgerê, ji bo amadekirina çînên karker û kedkaran ji bo desthilatdariyê û pêşengtiya şoreşê, hewldaneke mezin dan. Wan ji çîna karkeran baldariyek awarte wergirtin. Bernameya ku Rosa Luxemburg ji bo Lîga Spartacus nivîsandibû wek bernameya partiyê hat qebûlkirin. Armanca Rosayê ew bû ku Şoreşa Cotmehê ya li Elmanyayê ji aliyê siyasî ve misoger bike ku di demeke dirêj de wê şoreşeke sosyalîst çêbibe. Lê belê şoreşa Elmanyayê têk çû di çileya 1919'an de Rosa Luxemburg, Karl Liebknecht, Wilhelm Pieck hatin girtin bi îxaneta Partiya Sosyal Demokrat hatin girtin û piştî wê bi şkenceyên giran hatin qetilkirin û laşê wan hatin avêtin çemê. Di 31ê Gulanê de cenazeyê wê ditin.

Rosa Luxsembûrg bi şiyara "Ez hebûm ez he me ez ê Hebim" di tevahî qadên jiyanê de weke rêbereke komûnîst têkoşîn kir û jiyana xwe fidayî jiyaneke bêsînor û bêçîn kir. Têkoşîn, bawerî û biryardariya wê rê nîşanî têkoşîna me dide. Şoreş, îro ji çar aliyê cîhanê ji bo pêkanîna xeyalên Rosan, ji bo azadiya jinê, ji bo azadiya mirovahiyê banga "Ez hebûm, ez he me, ez ê hebim" dike. Ew wê her tim weke hiloyeke sosyalîst û pêşengeke jin a komûnîst rêya me ronî bike.

Li Kobanê Keda Ku Nayê Dîtin

Bihar Mistefa

Kobanê bajarekî biçûk e, bi aded û teqelîdên xwe, bi çanda eşirtiyê tê naskirin. Li vir pergala eşîrtî hîna pir derbasdar e. Ji bo wê jin di nav ev feraseta civakî de jin têne fetisandin. Jin weke namûs tê ditin. Li gorî zagonên eşîran pêwîst e jin her tim di malê de be. Berî şoreşê û piştî şoreşê em dibînin ku di civakê de ev tişt hîna derbasdar e. Rast e jin derdikeve derve û di saziyan de kar dike û cihê xwe di nava rêveberiyê de digire. Lê dema ku ji kar vedigere mala xwe disa tê kolekirin, dîsa rastî lêdan û rêbazên tundiyê weke nefsî, cinsî, fizîkî, aborî hwd. tê. Ji ber vê tundiyê gelekî jin xwe dikujin, bi rexmî rastî xwe kuştinê tê heya mirina wan bê qîmet e. Her axaftinê, her gotinê li ser kuştina wan dikin û întiharkirina wan de jinê sûcdar dikin.

Jin wekî karkereke bêwext 24 saet di hundirê malê de tê xebitandin. Keda jinan tê înkar kirin. Keda jinan di hundirê malê de bê qîmet e. Yani şoreş ne tenê derveyî malê, ne tenê saetên ser kar in. Dema Em dibêjin şoreşa Rojava şoreşa jinê ye, pêwîst e jin di hemû milan de, di hemû cih û qadan de bên rizgar kirin. Ji bo van tiştan heya jin dernekevin derveyî malê em nikarin bêjin jin azad bû ye. Di şoreşa Rojava de pêwîst e bayê şoreşê derbasî malan bibe, ger ku bayê şoreşê derbasî malan nebe ev pergala me ya şoreşa şoreşa jinê ye bê hilweşandin.

Ji ber vê yekê jî divê em fêr bibin û bidin fêr kirin ku jin weke jineke serbixwe, ne wek dayik, hevjîn an jî hevjîna şehîd were dîtin. Karê malê ne qedera me ye, an jî kirina karê malê nikare mezinahiya hezkirina me ji malbata xwe re nîşan bide. Na, mal û karê malê nabe dinyaya me. Dinya pir mezin e û îro piranî jinên li dewletên derve nîqaş dikin ku keda malê (xizmeta nexweş û kalan, xwedîkirin û perwerdehiya zarokan, xwarin, paqijî û hwd.) divê bi ratip bibe. Em di nava şoreşa jinê de dijîn. Lewma divê em bi vê hişmendiyê tev bigerin. Karê malê jî wek her karekî din kar e. Divê ev yek were nirxandin; Heger guh nede, biçûk were dîtin, dibe ku em jî wek hemû karkeran girêv bikin. Wê demê jiyan û dinya disekine. Her kes dibîne ku keda me jinan a ku nayê dîtin çiqasî girîng e û bingeha hemû kedê ye. Ji ber vê yekê em careke din dibêjin keda malê bi qîmet e û weke jinên komûnîst ên Rojava em ê li keda xwe xwedî derkevin.

Keda Jinê Pîroz e Keda Xwe Biparêze

Destan Serhed

Weke em dizanin dema em dibêjin jin di hundir civaka me de dayik tê bîra me, kar û xebatên wê yên mal tên bîra her kes. Lê qet nehatiye bîra wan ku ew hêz dikare bi deh qatan kar û xebatên mal û dervî mal bike . Bi taybet civaka Rojhilata Navîn ji bo jinê ji zaroktiyê de wê fêrî jiyana mal û li ser kar û xebatên mal dide perwerde kirin.

Dixwaze wê di wî milî de pêş bixe û zanebûna wê di wî milî de be ew zanebûn giştî jî li gorî xwesteka zilam e. Ji ber ku dayik dema ku diçe ku keçek ji lawê xwe re bixwaze karê wê yê mal bala wê dikşîne. Di wir de jinbûyina wê qiyas dike. Ev hemû jî kevneşopiya wê pêş dixe.

Di wir de êdî jin jî bi qebûlkirina van tiştan dibe koleya zilam û mal.

Ji ber ku dayik zarokan tîne û êdî xwedîkirina wan jî erka wê tê dîtin. Lê dema ku ew zarok jî xort be heya temenek li mal dimîne û piştre bi bavê xwe re diçe karê derve. Lê dema keç be li ser kar û xebatê mal tê perwerde kirin. Tevahî civak li gorî ev rolên civakî tê bi rê ve birin.

Êdî jin dûrî civak û durî her tişt dikeve, jiyana wê bi kar û xebatê mal tenê sînordar dibe.

Ji ber ku civak û bi taybet dayik wan fêrî vî tiştî dike ew jin bêdeng dimîne.

Ew tenê ne bes tevî ku jin bi kar û xebatên mal ve hemû radibe . Ew zilam dema ji karê xwe jî vedigere bi rêbazên şidet pêşwazî dike. Dema ku aciz be jî ew jin warê teqandina cihê aciziya xwe dibîne, yan jî em bibêjin eger xwarinek çêkiriye ew xwarina ku bi kedek hatiye çêkirin qebul neke. Di vir de tehdîdên ku derdikeve weke ez jineke din bînim yan ez te berdim. Ji ber ku ev civak bi çand û aded ve girêdayi ye. Tirsek di dilê jinê de tê avakirin û her tişt qebul dike û bêdeng dimîne. Weke her car zincîrên qeydê li dora xwe digerîne. Bi hezaran zincîr li xwe gerandiye her ku gavek davêje ew zincîr teng dibe û li derdora wê digere û wê difetisîne.

Feraseta zilamperest ew keda ku jin di hundirê malê de dide jî dixwe. Ji ber ku bi çavekî biçûk li ked û xebata jinê ya hundirê malê dinêre. Weke karekî sivik û bênirx dibîne. Ji ber vê di civakê de gotina yekemîn ku derdikeve li hemberî karê ku zilam derve dike karê jinê yê hundirê malê sivik e. Li ser vê esasê jin weke bêhêzî tê perwerdekirin û her tim karê mêr ji karê jinê hîna bi nirxtir û pîroz tê hesibandin.

Lê em ji bîr nekin ku ew kar u xebatê ku jin di hundir malan dike bi dehqatan ji gelek karan zehmet tire.

Ew dayika ya ku zarokan xwedî dike em ji bîr nekin ku nifşan ava dike ji bo wê yekê em dibêjin dayik pîroz in. Ger ne ew dayik an ew jin ba ew zilam jî hebûna wî li dunyayê tûne ye.

Ji bo wê yekê em dibêjin êdî anha ev şoreş pêwîst e ku derbasî malan bibe. Dema ku şoreş û azadî li deriyê me bide pêwîst dibe em bi hêz û baweriyeke mezin deriyê xwe vekin. Bila azadî di hundir malên me de bigere û bikeve mêjiya herkesî. Em bi taybetî jina ku ji aliyê kevneşopiyên civakî ve hatiye avakirin biguherin. Ev guhertin şkenandina zincirên koledariyê ye.

Jin Dayika Tevahî Mirovahiyê ye

Wîdad Mihemed

Jin dayika tevahî mirovahiyê ye, ji ber vê yekê divê birêxistin be, ji ber ku eger jin bi awayekî sîstematîk û saxlem were perwerdekirin û amadekirin, ev yek dê bibe sedema perwerdeyeke baş. Ji bo nifşeke nü û tevahiya gelan. Lê ev jin rastî gelek tundî, zext, zordestî û tunebûnê tê û ev feraseta mêranî ji demên kevnar heta roja me ya îro li ser wê serdest e û ev êş didome. perwerdehî û postên siyasî û serkirdayetî. Di gelek rewşan de, jin nikarin tiştên ku li ber xwe didin eşkere bikin, ji ber ku civak ne mêran tenê wan berpirsiyar dibîne.

Ev civak, civakeke gemarî ye û li gorî aded û teqelîdên kevnar û xerab e. Wek nimûne, eger jineke karker ji karê xwe vegere piştî westiyan, hewldan û demjimêrên dirêj ên kar, ew vedigere mala ku li bendê ye. ji bo wê, ku ew hewce ye ku hemî karên malê yên wekî xwarin, paqijkirin, hînkirina zarokan, lênêrîna wan û dabînkirina hewcedariyên wan bike. Dibêjin mala filanê paqij e, mala filan kesî ne paqij e. Zaroyên wî perwerde bûn e, ev çi neheqî ye? Edalet û heqî li ku ye?

Dem hatiya ku civak bi laneta xwe ya cahilî bitirsîne û divê jin ji van hemû, zincîr û feraseta zilam rizgar bibe.

Civaka otorîter ku tê de ji bilî mêr ti peyv tune ye û ji bilî mêr tê de azadî tune ye, ev hemû têgîn ji aliyê welatên bûrjûwazî û kapîtalîst ve hatine bicihkirin û ji azadiya jina azad re ji bo jina komunîst a şoreşger Jin sembola jiyanê ye. Bijî şoreşa jinê!

دعوة شيوعي روج أفا للانضمام في الأول من أيار

نفذت المرأة الشيوعية الثورية (JKŞ) والحركة الشيوعية الثورية (TKŞ) أنشطتهما قبل الأول من أيار ، ودعت العمال والعمال للمشاركة في الأول من أيار. تم تقديم برشورات للمصانع في الحسكة وكوباني ، وتم تقديم المنشورات للمنازل و في الأحياء ، ودعو العمال للمشاركة في الأول من ايار.

كوباني

في كوباني ، تقدم أعضاء JKŞ بطلب لعاملات في الفرن ، ووزعوا منشورات JKŞ ودعوا العاملات للمشاركة في حدث ١أيار. في الوقت نفسه ، تقدم أعضاء JKŞ بطلب على دعوة النساء للانضمام في ١ مايو.

الدرباسية

في الدرباسية، علق أعضاء TKŞ و JKŞ لافتات وملصقات لدعوة ١ أيار. قاموا بتوزيع جريدة سركفتن في الأحياء والشوارع ودعوا الناس للمشاركة في الأول من مايو.

الحسكة

قام أعضاء JKŞ في الحسكة بعمل مكثف قبل ١أيار. قدم أعضاء JKŞ المنشورات على عاملات في المصانع ، والعاملين في الاراضي في نطاق العمل والعمل في ١ أيار. تم توزيع المنشورات الإعلانية في هذه الأماكن وتم دعوة النساء للمشاركة في فعاليات الأول من أيار. منذ ذلك الحين ، علق أعضاء JKŞ لافتات وملصقات ١ أيار في نطاق هذه الأنشطة.

مرة أخرى ، في نطاق هذه الأعمال ، تم تقديم الدعوة إلى التنظمات النسائية مثل مؤتمر ستار ومجلس المرأة السورية وحزب التغيير الديمقراطي وعدالة المراة واسايش المراة

بالإضافة إلى هذه الأنشطة ، تم تدريب اعضاء JKŞ لأجل تاريخ ١ أيار. في التدريب الذي قدمته ممثلة المراة الشيوعية الثورية فاديا سيدو ، تمت مناقشة تاريخ ١ أيار ووضع المرأة العاملة.

قامشلو

في قامشلو ، تقدم أعضاء JKŞ و TKŞ في قامشلو بطلبات الدعوة الى العاملات قبل الأول من أيار ودعوا للانضمام الى الندوة. تم الاحتفال في الأول من ايار للعاملات وعقدت مناقشات حول وضع المرأة العاملة وعمل المرأة داخل المنزل.

انضم أعضاء JKŞ في الحسكة وكوباني ودرباسية إلى فعاليات واحتفالات الأول من أيار بشكل كبير ومع الاعلام

احتجت المراة الشيوعية الثورية على الاعتداء على الطفلة ووالدتها فى عفرين

احتج أعضاء من النساء الشيوعيات الثوريات على هجوم الاغتصاب على الفتاة تبلغ من العمر ١٠ سنوات ببيان

قرأت العضوة وداد محمد، البيان وفي خطابها ركزت على JKŞ نيابة عن جرائم الدولة التركية وعصاباتها مثل الخطف والقتل والاغتصاب ، إلخ.

